Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1027 | 01-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Hunermend û aktivîst divê bêdeng neminin!

**Hunermendên kurd bertek nîşanê êrişa li hember Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya ya li Parîsê pêk hat, dan û diyarkirin ku ji ber rastiyên di komkujiya Parîsê ya 2013'yan derneketin holê qetlîema duyem pêk hat.**

Li paytexta Parîs a Fransayê di 23'yê Kanûnê de li hember Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya suîkast pêk hat û




endama Tevgera Jinên Kurd a Ewropa (TJK-E) Emîne Kara (Evîn Goyî) Hunermendê Kurd Mîr Perwer (M. Şîrîn Aydin) û Abdurrahman Kizil hatin qetilkirin. Piştî vê protestoyên hatin destpêkirin didomin. Hunermendên Kurd jî bertekên xwe yên li dijî êrişê anîn ziman.

Lîstikvana Şanoya Bajar a Amedê Berfîn Emektar da zanîn ku ev komkujiya duyemîn di çarçoveya planekê de hatiye kirin û bi vê Gelê Kurd û hunermendên kurd hedef hatine girtin. Berfînê got: "Parîs wek cihê herî bi ewle ya cîhanê tê venasîn. Bajarê herî romantîk tê venasîn. Lê ji bo me kurdan maneya wê cudaye. Ji bo me êdî paytexta komkujiyane. Êrişa duyem li hember Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya pêk hat. Hedefgirtina navendeke çandê bi tu awayî nayê qebûlkirin. Hunermend li welatên xwe yanî li Tirkiyeyê xwe ewle hîs nakin û ji ber çand û stranên wan tên qedexekirin, ji ber cezayan neçar dimînin derkevin dervayî welat."

**Li pişt bûyerê çi heye gelo?**

Berfînê da zanîn ku ev êriş wê pêşî li xebatên çanda kurd negirin û got: "Kurd wê çanda xwe zimanê xwe, hunera xwe didomînin. Mîr Perwer ji Muşê çû Parîsê. Hunera xwe li wir domand. Hişmendiya hunerê hebe wê bidome. Mîr Perwer yek ji van bû. Divê ev êriş wek êrişek ji rêzê neyê dîtin. Li pişt vê çi heye. Li Parîsê qetilkirina mirovan **evqas rehete gelo?"**

**Ewrûpa ji bo Kurdan cihekî ne ewle ye!**

Derhênera kurd Lîsa Çalan jî helwêst nîşanê komkujiyê da û got: "Li dijî komkujiyê divê bêhtir dengên me bilind bibe. Ez bêdengiyê rexne dikim. Em çapemeniya navneteweyî jî şermezar dikin. Hêrsa me gelek mezin e. Êriş ne munferît e. Ewrûpa ji bo kurdan bûye cihekî ne ewle. Peyamên me yên li ser tora civakî têrê nakin. Em hunermend û aktîvîst divê li dijî vê rabin. Bêdengiya ku niha li holê ye me bêhtir hêrs dike."

**'Dixwazin bûyeran bidin jibîrkirin'**

Lîsayê bi vî awayî dawî li axavtina xwe anî: "Di 2013'yan de jî komkujiyek din li Parîsê pêk hat. Li Ewrûpa ne tenê li hember kurdan li hember aliyên din jî êriş hene. Li Parîsê ev ne komkujiya yekem e. Sê hevalên me yên din jî di sala 2013'yan de li Parîsê hatin qetilkirin. Ev ne tesadûf e. Ev êrîş bi awayekî sîstematîk pêk tên û dixwazin ser van bûyeran bigirin."-***Ozgurpolitika***

# Li Qamişloyê şahiya sersalê

**Li Qamişloyê bi boneya sersalê şahiyek hat lidarxistin.**

Bi boneya sersalê, Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê û Tevgera Mezopotamiya ya Çand û Hunerê şahiyek li Navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo li dar xist. Bi dehan kes di şahiyê de amade bûn. Di şahiyê de Komîna Şano ya Navenda Mihemed Şêxo şanoya xwe ya bi navê "Xewnên windayî" pêşkêş kir. Şano balê dikişîne ser pirsgirêkên civakî û aborî yên civakê.




Piştre Koma Şehîd Welat stran, dîlanên folklorî û mûzîk pêşkêş kirin.

Di dawiyê de hunermend Danîş Botan û Amir Remo stran gotin. -***ANHA***

# Li Kurdistan û Tirkiyeyê ji bo sewalkariyê saleke zehmet bû

**Ji ber polîkayên şer ên AKP'ê pirsgirêkên li sektora sewalkariyê dewam dikin. Bi zêdebûna buhayê êm, ka û giha re sewalkar nikarin hevsengiyê di navbera hatine û lêçûnan de daynin û neçar dimînin ku sewalên xwe bifiroşin.**

Ji ber polîtîkayên desthilatdariya AKP'ê yên girêdana bi derve re, tengaviya li sektora sewalkariyê zêde dibe. Li gel enflasyona ku di ser asta ji sedî 400'î re ye, zêdebûna buhayê êm, ka û giha, sewalkarî gihandiye ber têkçûnê. Xwediyê sewalan hem nikarin qezencekê ji berhemên xwe bi dest bixin, hem jî bi buhayekî zêde pêşkêşî serfkaran têne kirin. Hikumet bi polîtîkayên xwe yên kirîna ji derve re, ji bo berhemên şîr, hilberîna li bazara navxweyî kêm dike. Ev jî dibe sedem ku ev berhem bi zorê bigihêje serfkaran.

Di nava salekê de gelek sewal hatin firotin û ji ber zêdebûna lêçûnên wê, gelek çêlek û sewalên din hatin serjêkirin. Sewalkariya li gund û qadên bejahî di asteke girîng de kêm bû.

Sewalkarî li Kurdistanê çavkaniyeke cidî ya kar û debarê ye. Bi taybetî li qadên bejahî, sewalkarî çavkaniya bingehîn a debarê ye, her wiha hîmê esasî yê sewalkariya li welêt e. Li Kurdistanê zêdebûna buhayê êm, kar bandorê li sewalkariyê dike. Sedema bingehîn a vê yekê jî ew e ku xwezaya Kurdistanê ji bo armancên leşkerî tê bikaranîn.

Sewalkariya şîr û bazirganiyê ya li Kurdistanê bi salan qadeke mezin a kar e. Kaniyên li herêma Serhedê, çêrgehên wê yên dewlemend ji bo vî karî gelekî girîng in.

Destwerdana desthildariya AKP'ê ya di bin navê madenê de li qadên xwezayî, gelek çêrgehên sewalkariyê bêbandor kir. Ev yek bû sedem ku herêm hîn bêhtir bêaram bibe hem jî derbeke mezin li sewalkariyê bê xistin.

Sewalkarên herêma Serhedê, ji ber ku mehên zivistanê gelekî dijwar û bi berfê



derbas dibin, ji bo lêçûna êm û ka kêm bike, zivistanê koçî Riha, Amed, Mêrdîn, Xarpêt û bajarên mîna wan dikin.

Lê belê îsal ji ber buhayê veguhastinê bi 4 qatî zêde bû, sewalkar li şûna ku koç bikin, dest bi firotina sewalên xwe kirin. Salên dawî ji Brezîlya, Çekya û Awûstralyayê sewal têne kirîn. Bi giranî sewalên Angus, Simental û Montofon têne kirîn. Sewalkar dibêjin şert û mercên xwezayî ji bo xwedîkirina van sewalan a li derve guncav nîne, lewma jî ev heywan bi giranî li hundir bi êm têne xwedîkirin û tenê ji bo serjêkirinê têne tercîhkirin. Ev heywan li şûna sewalkariya şîr, ji bo bazirganiyê û serjêkirinê têne xwedîkirin.

***ANF***

Sudoku:Pirs 37

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 7 | | | | 6 | 1 | | |
| 8 | 2 | | | | 9 | | | 3 |
| | | | | 4 | 8 | | | |
| 4 | 5 | | | | | 9 | | |
| 6 | 3 | | | 7 | | | 8 | 2 |
| | | 8 | | | | | 4 | 7 |
| | | | 2 | 9 | | | | |
| 5 | | | 4 | | | | 7 | 6 |
| | | 2 | 8 | | | | 9 | 4 |

Sudoku: Bersiv 36

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 3 | 2 | 9 | 5 | 4 | 7 | 6 | 8 |
| 6 | 9 | 5 | 2 | 8 | 7 | 3 | 1 | 4 |
| 7 | 8 | 4 | 6 | 3 | 1 | 9 | 5 | 2 |
| 4 | 5 | 9 | 7 | 2 | 8 | 6 | 3 | 1 |
| 3 | 1 | 8 | 4 | 6 | 5 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 6 | 3 | 1 | 9 | 8 | 4 | 5 |
| 8 | 4 | 7 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 6 |
| 9 | 6 | 1 | 8 | 4 | 2 | 5 | 7 | 3 |
| 5 | 2 | 3 | 1 | 7 | 6 | 4 | 8 | 9 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Endam | **1.Kesê ji komeke taybet: Endamê Koma Awazên çiya. Endamê partiyê. Endamê malbatê. Endamê gelekî. 2. Parçeyên bedenê: Mînak; çav û dest endam in. 3. Parçeyek ji tevayiya tiştekê.** |
| Folklor (Fransî) | Zanista gel, zargotin, çîrok, helbest, stiran û govendên gelêrî. Hunera di nava gel de belav bûyî lê afrînerên wê nayên zanîn. |
| Komplo (Fransî) | Plana kesekî yan çend kesan li dijî kesekî, yan komekê, yan dewletekê. |
| Merasim (Erebî) | Dêlîndêz, rêûresm, ayîn, resmiyet, seremonî. Civîneke fermî ji bo pîrozkirin yan jî bîranîna kesekî yan bûyerekê: Ji bo bîranîna şehîdan merasimek hat lidarxistin. |
| Mêtîngeh | Kolonî, welatê yan devera dagîrkirî. Welatê biyanî tê de serdest in. |
| Mêtînger | Kesên mêtîngehan bi rê ve dibin, dagîrker. |
| Nivîsgeh | Bûro, ofîs, daîre, dezgeh: Em çûn nîvîsgeha kirîna xaniyan. |
| Pirtûk | Komek perên kaxizan yên binivîs yan biwêne yên di nava du bergan de hatîn çapkirin. Kitêb. |
| Proje (Fransî) | 1.Karekî diyarkirî yê ku piştî çend qonaxan diqede: Rêveberiyê ji bo bêkaran projeyek amade kiriye. 2. Plan, progrem, bername, amadekarî. Ti kes nizane ka plan û projeyên wî çi ne. |
| Şermezar Şermezarkirin | Şermezar: Kesên ketîn şermê, kesên ji ber kêmayiyên xwe şerm dikin: Ji ber ku bavê min dît ez cigareyê dikişînim, ez şermezar bûm. Şermezarkirin: Diyarkirina qebûlnekirina gotin yan kiryara kesekî yan hêzekê. Rûreşkirin: Welatiyan kuştina jinan şermezar kir. |

# YPJ'ê nasnameya jinên têkoşer û azadîxwaz e

Têkoşîna YPJ'ê deng li cîhanê veda û bi dehan jin ji welatên cîhanê berê xwe dan nava refên Yekîneyên Parastina Jinê. Ji bo ku jin bikarin hêz û hebûna xwe di hemû aliyan de îspat bikin, avakirina YPJ'ê ji bo hemû jinan bû pêngavek mezin. *R-2*



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1027 | 01-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# KCK: DI SALA NÛ DE TÊKOŞÎNÊ MEZINTIR BIKIN Û JIYANÊ AVA BIKIN

Hevserokatiya KCK peyamek ji bo sala nû weşand. Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK di peyamê xwe de; Ji bo sala 2023'an bibe saleke serketinê bang li hêzên demokrasiyê yên li tevahiya cîhanê kir ku, bi perspektîfa modernîteya demokratîk têkoşînê mezintir bikin û jiyanê ava bikin.



## Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê dewam dike

Tevî ku rêjîma Îranê li hemberî xwepêşanderan girtin, êşkence û kuştinê jî dike, gelên Rojhilatê Kurdistan û Îranê serhildana li dijî rêjîmî bênavber didomîne, herî dawî li bajarê Ciwanro yê Rojhilatê Kurdistanê ciwanekî Kurd di êrişa hêzên rêjîma Îranê de jiyana xwe ji dest da. *R-3*

## Operasyona Birûska Cizîrê dewam dike

Di roja 3'yemîn a operasyona 'Birûska Cizîrê' de li gundewarên Til Hemîsê 32 çeteyên din ên DAÎŞ'ê hatin girtin. Li navçeya Til Birakê jî operasyonê destpê kir. R-3

## 'Armanca dewleta Tirk ya dagirker qirkirina Kurdan e'

Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Efrînê diyar kirin ku armnca dewleta Tirk ya dagirker ji êrîşên kîmyayî yên li ser qadên gerîla qirkirina gelê Kude û gotin, gerîlayên azadiyê parazvanên xeta azadiya gelan e, ew ê bi vîna xwe dagirkeran têk bibin.*R-4*

## 'Armanc ji hedefgirtina jinan qirkirina civakê ye'



Berpirsa Desteya Jin ya herêma Efrînê Emîne Mele Hesen diyar kir ku sûcên dewleta Tirk ya dagiker yên li dijî jinan ji despêka dagirkirina Efrînê ve û heta neha bênavber dewam dikin û got, dagirkerî dixwaze di şexsê jinan de vîna civakê têk bibe. *R-2*

## Panorama Rêveberiya Sewldariyê ya 2022`an




Di sala 2022`an de Rêveberiya Sewaldarî li herêma Cezîrê, li gorî derfetên heyî ji tevayiya sewalvanan re bû alîkar, herwiha pêwîstiyên wan peyda kir û hewl da rewşa sewaldariyê li herêmê bi pêş bixe. *R-6*



Fransa Hemsûcê Kujeran E
Ahmet Aktaş *R-5*



Civîna Urdunê û Komkujiya Parisê
Ahmet Aktaş *R-5*



Li Parîs lêgerina edaletê
Farûk Sakik *R-4*

# ’Armanc ji hedefgirtina jinan qirkirina civakê ye’

Berpirsa Desteya Jin ya herêma Efrînê Emîne Mele Hesen diyar kir ku sûcên dewleta Tirk ya dagiker yên li dijî jinan ji despêka dagirkirina Efrînê ve û heta neha bênavber dewam dikin û got, dagirkerî dixwaze di şexsê jinan de vîna civakê têk bibe.

**Zana Roj/ Şehba**

Berxwedana serdemê a ku muhra xwe li dîroka Kurdistanê û tavahî cîhanê xistiye, di 20’ê çileya 2018’an de destpêkirin. Li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, herwiha li hemberî tevahiya hêzên ku ji dagireran re bûn alîkar, gelê Efrînê û têkoşerên azadiyê bi qehrenantî û berxwedaneke bê hempa destanên lehengiyê nivîsandin. Gel li ser bingeha stratejiya Şerê Gelê Şoreşger tevgeriya, li kêlek şervanên ku di çeperên şer de bê rawestandin têkbirina dijmin û parastina axa xwe kiribûn armanc, bi lehengî û qehremanî berxwedaneke dîrokî meşandin. Berxwedanî 58 rojan bi biryardariyeke mezin dewam kir. Gel di bin şert û mercên dijwar de li hemberî tavahî cûreyên teknîk û çekên giran yên qedexekirî û balafirên şer, destana dîrokî a qehremantiyê di berxwedana Serdemê de nivîsandin.

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi dagirkirina herêma Efînê re, ji 18’yê Adara 2018’an ve û heta niha, tavahî cûreyên binpêkirin, guhartina demografîk, talan kirin, kûştin û revandin kirine. Dagirkeriyê li şona gelê herêmê yê resen, 400 hazar kes ji malbatên çateyan û xelêkên deverên din li herêma Efrîn bi cih kirin. Di nava van kiryar û sûcên ku hatine kirin Jî, para herî mezin ya jinan bû. Jin û jinên ciwan yên ku di Efrînê de man e, rastî gelek cureyên destdirêjiyê hatin. Jinên ku ji aliyê çeteyan ve hatin girtin, li girtîgeha rastî kiryarên dijmirovî hatin. Gelek jin ku ji destpêka dagirkirina Efrînê ve ji aliyê çeteyan ve hatibûn girtin, heta niha çarenûsa wan ne diyare. Derbarê kiryarên nemirovî yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî jinan li herêma Efrînê, berpirsa Desteya Jin ya herêma Efrînê Emîne Mele Hesen ji rojnameya me re axivî.

Emîne Mele Hesen diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji destpêka dagirkirina Efrînê ve jin kir hedef û wiha got: “Bi dagirkirina herêma Efrînê û derbasbûna komên ceteyan ji herêmê re, dagirkeriya Tirk û çeteyên wê tavahî kiryarên dijmirovî li ser gelê ku di Efrînê de mane da meşandin. Dagirkeriyê guhertina demografîk û têkbirina xwezaya Efrînê bi awayekî rêk û pêk meşand. Yekem destdirêjî Ku ji aliyê dagirkedriyê ve hat kirin li ser jinên kurd yên Efrînî bû. Komên çete bi sedan jin li Efrînê girtin û bi zorê hatin zewicandin, Herwiha destdirêjî li wan hat kirin. Dagirkeriyê jin bi zorê ji malên wan derdixistin û ew di girtîgehan de destirêjî li ser wan dihat kirin. Herwiha gelek jin jî hatin kuştin û çarenûsa pir jinan heta îro nediyar e.

**’Dixwazin di şexsê jinê de civakê hilweşînin’**

Emîne bal kişand ser armanca hedefgirtina jinan ji aliyê dagirkeran ve wiha û domand: “Dagirkeriyê bi hedefgirtina jinan li herêma Efrînê, xwest tirsê di nava civakê de bidin avakirin û serdestiya xwe li ser gel bi darê zorê feriz bikin. Ji ber wê jin ya herî zêde rastî bûyerên tunbdî û hedefgirtinê tê. Dijminên Kurdan jinên Kurd yên Têkoşer û zana li her deverên cîhanê dike hedef û li dijî jina kurd komkujiyan pêk tîn e. Jinên Kurd yên azadîxwaz li ku



derê bin dagirkeriya Tirk êrîşî wan dike. Sîstemên desthilatdar dixwazin îrade, vîn û helwesta jina azadîxwaz, têk bibin û civakê di şexsê jinê de hilweşînin”

**’Li hemberî sûcên li dijî jinê tên kirin her kes berpirsyare’**

Rêvebera Desteya Jin ya herêma Efrînê Emîne Mele Hesen banga li tavahî tevgerên ji bo parastina mafê jinan kar ku li hemberî sûcên li dijî jinên Efrînê bêdeng nemînin û axaftina xwe wiha qedand: “Li herêmên dagirkirî jin ya herî zêde di bin fikirên çeteyên DAÎŞ’ê de rastî kiryarên dij mirovî û tundiyê tên, di nava van qeyranan de sûcên herî giran li ser jinê tên ferzkirin, li hemberî tavahî jinên ku li herîmên dagirkirî jiyan dikin. Her wiha em banga tavahî rêxistinên ku ji bo azadiya jinê û rakirina tundiyê li ser wê kar dikin ku xwe berpirsyar bibînin û rewşa jin û zarokan di Efrîn û tavahî herêmên dagirkirî de bişopandin.”.

**Kiryarên dagirkeriyê ya 5 salan**

Piştî dagirkirina Efrînê, dagirkeriyê û çeteyîn wê di 5 salan de zêdetirî 663 welatiyên Efrînî hatine kuştin, ji wan 97 jin in. Herwiha li dijî 71 jinan destdirêjî hatiye kirin û 213 jin di bin tundî û îşkenceyê re derbas bûne, her wiha zêdetirî 10 zarokan hatine kuştin.

**Kiryarên dagirkeriyê yên 2022**

Di sala 2022 an de li gorî Saziya Mafê Mirovan yê Efrînê bi gîştî 33 welatî JI ALIYê DEWLETA Tırk ya dagirker ûçeteyên wê ve hatin e kuştin, ji wan 13 jin in, her wiha 46 jin jî hatine revandin û çarenûsa wan nediyare.

# YPJ’ê nasnameya jinên Têkoşer û azadîxwaz e

**Navenda Nûçeyan**

**Têkoşîna YPJ’ê deng li cîhanê veda û bi dehan jin ji welatên cîhanê berê xwe dan nava refên Yekîneyên Parastina Jinê. Ji bo ku jin bikarin hêz û hebûna xwe di hemû aliyan de îspat bikin, avakirina YPJ’ê ji bo hemû jinan bû pêngavek mezin.**

piştî salên dûr û dirêj ji çewisandin û paşguhkirinê , bi destpêkirina Şoreşa Rojava ya 19’ê Tîrmeha 2012`an re, jinên Kurd yên Rojava Têkoşîna jinan derbasî qonaxeke nû kir. Jin tevlî nava saziyên rêveberiya herêmê bûn. Herwiha bi avakirina Yekîneyên Parastina Gel (YPG) re, jin li Rojava bi coşeke mezin beşdarî nava refên YPG’ê.

**YJA Star bingeha şoreşa azadiya jinê ye**

Ji ber ku gerîlayên YJA Star xwedî ezmûnek bi salan dirêj ji têkoşîn û berxwedanê ne. YPJ’ê di aliyê xwe rêxistinkirin û perwerdeya leşkerî de, ew ji bo xwe kirin mînakek bingehîn. Li ser wê binghê tabûrên leşkerî yên taybet yên jinan hatin avakirin. Tabûra yekemîn li navçeya Cindirêsê ya Efrînê bi navê Tabûra Şehîd Rûken hat avakirin. Piştî wê li Dirbêsiyê tabûra Şehîd Berçem, li Dêrikê tabûra Şehîd Sozdar û li Qamişlo tabûra Şehîd Edalet, hatin damezrandin. Yekem akadîmiya leşkerî ya taybet ya jinan jî, akadîmiya Şehîd Şîlan ya Dêrikê bû û dewreya yekê bi navê Şehîd Rêvan di 9’ê Gulana 2013’an de bi dawî bû.

**Damezrandina YPJ’ê**

Lewra piştî li seranserî herêmê tabûrên jinan hatin avakirin, 2’ê Nîsana 2013`an YPJ`ê li bajarê Dêrikê konferansa xwe yekemîn li dar xist. ji ber ku 4’ê Nîsanê roja rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalane, gelê Kurd û bi taybet jinên Kurd vê rojê roja vejîna xwe bi nav dikin, di 4’ê Nîsana 2013’an de damezrandina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) li Rojava hate ragehandin.

**Stêrka YPJ’ê geş bû**

Ji dema êrîşên Cebhet El-Nusra û Ehrar El-Şam li dijî Kobanê, Serêkaniyê, Cezaa, Til Hemîs, Til Birak û Til Temirê sala 2013’an ve, YPJ’ê roleke sereke lîst û di vê rê de şehîd dan Dema komên çete di 25’ê Gulana 2013’an de, êrîşî gundewarên Efrînê kirin, di berxwedana li hemberî êrişan de, Şehîd Silava Efrîn bû şehîda yekem ya YPJ’ê

**YPJ’ê ji Kobanê heta Dêra Zorê, tarîtiya DAIŞ’ê têk bir**

Piştî êrîşên DAIŞ’ê yên li dijî Kobanê yên 15’ê Îlona 2014’an, YPJ têkoşîneke bê hempa meşand û rola wê di rizgarkirina Kobanê ji çetreyan sereke bû. Bi wê re jî YPJ, bala cîhanê tevî kişand û bû sembola berxwedan û têkoşîna jinê. Li ser wê bingehê gelek jinên cîhanê tevlî nava refên YPJ’ê bûn, mîna şehîda Almanî Ivana Hoffman ku 7’ê Adara 2015’an, şehîd bûbû.

Rola YPJ, beşdarî pêngavên QSD`ê yên li dijî DAIŞ`ê ku li Holê, Minbicê, Tebqa, Reqa û Dêrazorê dan meşandin bûn û rola wê sereke bû. Di 2018an dema ku dewlleta Tirk ya dagirker êrîşê Efrîn kir, YPJ’ê berxwedaneke dîrokî raber kir. Weke dewama komploya navnteweyî jî dewleta Tirk 2019’an êrîşî Girê Spî û Serê Kaniyê kir, YPJ’ê weke her carê canê xwe ji parastina xak û civakê kir, li wir jî heya dawî têkoşîn kirin. YPJ di hemû pêngavên xwe de fikir û felsefeya Rêber Ocalan ji bo xwe kiriye armanc.

Şoreşa Rojava bi Şoreşa Jinê hat pênasekirin, di 8’ê Sibata 2015’an de Fermandara wê demê ya YPJ’ê Nesrîn Abdulla serdana Fransayê kir û bi serokkomarê wê demê François Hollande re civiya. Fransa Hollande, ji fermandara YPJ’ê Nesrîn Abdulla re got; “Piştî Napalyon tû yekem kesî ku bi cil û bergên leşkerî ve hatî nav koşka komara Fransayê.” Herwiha heya niha bi dehan film li ser berxwedana şervanên jin hatine amadekirin. Saziyên ragihandinê yên cîhanê, ji bo ji nêz ve berxwedana şervanên YPJ’ê bibînin, berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê.

**YPJ’ê nasnameya tevhî jinên Cîhanê misoger kir**

YPJ’ê bandoriya xwe weke parêzvana mîrasa jinê da çêkirin. Ji ber ku ji destpêka avakirina wê heya roja me ya îro YPJ’ê her tim misyona xwedî derketina mîrasa jin parast,



xwe şopdarê û xwedî wê didît, xwe dewamkirina wê didît û bi vê berpirsyartiya kûr her tim pêşengtî girte ser xwe. Ji ber vê yekê jinên li herêmê û cîhanê hêvî, bawerî, tecrîbe, hêza cesarete û lêgerîna nasnameyê ji YPJ’ê girt. Mînakên wê yên ber bi çav jî têkoşîna jinên efxan û serhildana jinan li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ye. Tekoşîn û serhildanên ku niha jinên îranê didin meşandin, tekoşînekî azadî û demokrasiyê ye, tekoşînekî ji bo parastina hebûn û mafê jinê ye. Têkoşîna jinê ne tenê ji bo jin e, tekoşîna jin ji bo civakê. Tekoşîna jin ji bo demokrasî û azadiyê ye, ji bo jiyanekî bi wate ye. Ji bo vê hemû berhemê ku ji tekoşîna jin derkeve holê wê rûhê civakbûnê di nava xwede bigre û herkes wê jê sûd werbigre û yê bikeve xizmeta mirovahiyê de.



# Bi hûnera xwe ji bo kesên pêdawistiyên taybet dibe hêvî

Jina ciwan Sînor Kerîm ku xwedî pêdawîstiyên taybet e du meh in karên destan çêdike û bi vê xebata xwe ji bo hemû kesên xwedî pêdawîstiyên taybet dibe hevî û çavkaniya hêzê.

Jina ciwan Sînor Kerîm a 21 salî ji bajarokê Seyîd Sadiq ya girêdayî bajarê Silêmanî ya Başurê Kurdistanê ye û heta pola 10’emîn xwendiye. Sînor Kerîm a 18 sal e Endama Komaleya Bejin Bostên Silêmanî ye, yek ji wan kesên xwedê pêwîstiyên taybet e û bi îrada xwe li hemberî zehmetiyên ku pe re rû bi rû dimîne têdikoşe. Sînor Kerîm li ser jiyana xwe, hûnera ku pê re ji gelek kesan re dibe hêvî û çavkaniya hêzê qal kir.

**‘Hemû kes dikarin bixebitin’**

Der barê hunera karên destan de, Sînor Kerîm wiha got: “Xebat hestek gelek xweş e, ez gelek pê kêfxweş dibim, hem di aliyê derûnî de, hem jî di aliyê madî de alîkariya min dike. Hemû kesên bi tendirust jî û yên xwedî pêwîstiyên taybet jî dikarin kar bikin.”

Sînor Kerîm di pêşangehan de berhemên xwe bi xelkê daye nasîn û firotiye. Bi beşdarbûna pêşangeha yekem dikaribû berhemên xwe nîşan bide. Sînor Kerîm wiha behsa xwe dike: “Min destpêkê li mal dest bi kar kir, piştre ez beşdarî dewreyeke perwerdeya hunera karên destan bûm. Di nava 13 keçan de ez tenê xwedî pêwîstiyên taybet bûm. Ew dewreya perwerdeyê bû sedema destpêkek baş ji bo ku heta niha kêrhatiya xwe ya hunera karên dest berdewam bikim.”

**‘Gelek kes piştgiriyê dide min’**

Sînor Kerîm wiha behsa pêşwazîkirina xelkê ji bo karê xwe dike û dibêje: “Piştgiriya wan ji bo min cihê kêfxweşiyê ye ji bo ku karê min ecibandin pir bextewar bûm. Ji bo ku ez di medyaya dîjîtal de malperek taybet vekim û berhemên xwe nîşan bidim piştgi-



riya min dikin. Ez berhemên xwe li gorî fikrên xwe çêdikim û her wiha ji bo fêrbûnê, sûdê ji medyaya dîjîtal jî digrim. Daxwaza min ji jinan ew e ku bi xwe kêrhatiyên xwe keşif bikin, xwe bibînin û li ser kêrhatiyên xwe bixebitin.” -*JİNHA*

# Li Qamişlo şahiya îmzekirina komhelbesta helbestvan Kemal Necim

**Nivîskar û helbestvan Kemal Necim di çarçoveya çalakiyên HRRK`ê li Qamişlo de, komhelbestê helbesta xwe ya bi navê “Sevbêrkên Spî” îmze kir.**

Di roja 9`an a çalakiyên Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) de ku bi dirûşma “10 mûmêm dawîn” li dar xistiye, nivîskar û helbestvan Kemal Necim berhema xwe ya bi navnîşan “Şevbêrkên Spî” îmze kir.

Bi dehan rewşenbîr, nivîskar, wêjevan û nûnerên Yekitiya Ragihandina Azad (YRA) û Kongreya



Îslama Demokratîk di çalakiyê de beşdar bûn ku li navenda HRRK`ê ya li taxa Siyahî ya Qamişlo hate lidarxistin.

Di destpêka çalakiyê de, 9 mûm hatin pêşxistin, piştre endamê Desteya Rêveber HRRK`ê Ehmed Hisênî axivî û bixêrhatina beşdaran kir. Her wiha Hisênî pesna helbestvan Kemal Necim û berhemên wî di nivîsandina wêjeyên kurdî de da.

Der barê pirtûkê de rojnamevan Diyar Botî wiha axivî: “Pirtûk di nav xwe de gelek wateyên wêjeya kurdî û wateyên dîrokî hewandibû. Dema helbestvan xeyal, şibandin û wêje bi hev re bi kar bîne, taybetmendiyekê digire. Helbestvan Kemal Necim wisa kiriye û hişê xwêner muxateb girt.”

Her wiha helbestvan Konê Reş wiha behsa pirtûkê kir: “Helbestvan Kemal Necim, ji me re girîngiya zimanê dayîkê bi rêya komhelbestê xwe îsbat dike ku 5 pirtûk bi zimanê kurdî nivisîn. Ew yek ji kesên ku li ser rêya seydayê Ceger Xwîn û gelek helbestvan û wêjevanên kurd meşiyaye ku navên xwe bi tîpên zêrîn di nava rûpelên dîrokê de nivisîne.”

Helbestvan Mehmûd Ebdo jî, îşaret bi wateyên di nava pirtûkê de kir ku pirtûk veguherandiye yek ji berhemên dîrokî û wêjeyî û çandî û wiha domand: “Helbestvan Kemal bi rêya peyvên xwe yên zelal û diyar, taybetmendiyeke hunerî daye pirtûkê û komhelbesta xwe. Ew gotin bi kar anî ku dibêje, helbestvan neynûka civakê ye ku wêneya rast a civakê di helbesta xwe de rave dike.”

Paşê helbestvan Kemal Necim çend beyt ji helbesta xwe ji beşdaran re xwendin û piştî îmzekirinê, berhemên xwe diyarî beşdaran kir.

Çalakiya “10 mûmên dawîn” di 21`ê Kanûnê de dest pê kirin. Wateya dirûşmê wiha ye ku “10 rojên dawîn ên îsal û pêşwazîkirina sala nû”. Tê payîn ku çalakî 30`yê mehê bi dawî bibe. -*ANHA*

# Hunermend û sînemekar ji ber paşketina şano û sînemayê bifikar in

Hunermend û sînemekarên Herêma Kurdistanê diyar dikin ku Kurdistan xwedî sedan çîrokên komkujiyê û neteweyî ne, dikarin sedan fîlmên sînemayî li ser werin çêkirin, lê ji ber sedema hikûmet alîkariyê nade hunera sînema û fîlm di astek gelek xereb de ye.

Hunera sînemayê yek ji wan karane, mirov dikare bi riya wê êş û pirsgirêkên gel û civakê ji derve re ragihîne, lê li Herêma Kurdistanê tevî ku gelek lîstikvanên baş hene jî, nekarîne vî karê hunerî pêşve bibin. Ji ber ku bi giştî hunera şano, sînema û fîlman paş ve diçe, hunermend bifikar in û aliyên peywendîdar û hikûmet jî di vî warî de ti alîkariyê nakin.

**‘Li Kurdistanê sînema gelek lawaze’**

Sînemakar Şiwan Sosekanî li ser mijarê ji Rojnews’ê re axivî û got: “Sînema çandeke ku divê têkelî xelkê were kirin. Ji bo ku ferd û desthilat girîngiya sînemayê bizanibin. Sînema çanda gel bi cîhana derve dide naskirin. Li Kurdistanê sînema gelek lawaze. Nikarîn bêjin, li Kurdistanê tiştek bi navê sînemayê heye. Her çiqas ji bo hilberîna fîlm ji aliyê hunermendan ve hewldan tê dayîn, lê hewldan gavên destpêkê ne, divê çîroka fîlman ve were guhertin. Hinek çîrokên me hene, fîlman dikin cîhanî, ne herêmî.”

Sînemakar Şiwan Sosekanî diyar kir ku Kurdistan ji bo sînemayê guncave û wiha domand: “Lê, niha sînema bûye bazirganî, divê kesên xwedî sermaye derkevin pêş û alîkariyê bidin. Tenê bi hikûmetê nayê meşandin. Li Kurdistanê sînema lawaze. Berhemên mezin ên sînemayê nîne. Ne sermeydar û ne jî medyeya mezin heye alîkariyê bike. Weke mînak, li welatên derve, medya ji bo hilberîna fîlm gelek alîkariyê dike, lê eger medya Kurdî fîlmekê çêbike, berhemê fîlm gelek lawaze.”

**‘Divê em hemû ji bo pêşxistina sînemaya Kurdî hewl bidin’**

Sînemakar Şiwan Sosekanî destnîşan kir ku weke Başûrê Kurdistanê pêwîstiya wan bi sînemayek pir baş heye û got: “Divê em hemû ji bo pêşxistina sînemaya Kurdî hewl bidin. Divê sînema bibe çanda gel, heta ku bikarîn fîlmên baş hilberînin. Li Başûr ewqas çîrokên jenosîk û komkujiyê û doza neteweyî heye, dikarîn gelek fîlmên mezin ên cîhanî jê hilberînin, lê mixabin ev yek nehatiye kirin.”

**‘Alîkarî nayê kirin’**





Lîstikvan Werzêr Mensur ji Rojnews’ê re got: “Li cîhanê sînemayê girîngiyek mezin heye. Li tevahiya cîhanê bûye sermayeyek mezin, ew hewldanên li Kurdistanê di warê sînemayê de hene, hewldanên şexsî ne. Saziya sînemayî pêwîstî bi hemahengiya navneteweyî û aliyên darayî ya gelek baş heye. Li Kurdistanê, sînema di asta pêwîst de nîne, alîkarî nayê kirin. Çi weke Wezareta Rewşenbîrî yan jî hikûmeta Herêma Kurdistanê alîkarî nake. Karê wê bi girîng nayê meşandin. Hunermend bi aboriyek kêm û alîkariya hevalên xwe dikarin karê xwe bikin.”

Lîstikvan Werzêr Mensur diyar kir ku ji bo hilberîna karê baş hewldanên cidî heye, lê di asta navneteweyî û derve de di astek gelek lawaz de ye û wiha bi dawî kir: “Hejmarek kêm a hunermendan bi hilberîna fîlman ve mijûl in. Ti hunermend an jî xebatkarên hilberîna fîlman tewanber nînin. Belku aliyên peywendîdar ku desthilat û hikûmet li beramberî sînemayê tawanbare, ji ber ku ev kar bi piştgiriya dewletê yan jî hikûmetê dikare were kirin, ne aliyan û kes.” - ***ROJNEWS***

# Panorama Rêveberiya Sewaldariyê ya 2022`an

Di sala 2022`an de Rêveberiya Sewaldarî li herêma Cezîrê, li gorî derfetên heyî ji tevayiya sewalvanan re bû alîkar, herwiha pêwîstiyên wan peyda kir û hewl da rewşa sewaldariyê li herêmê bi pêş bixe.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Sewaldarî beşeke bingehîn ji aboriya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ji ber ku herêm ji aliyê sewaldariyê ve dewlemend e û çavkaniya debara xelkên herêmê ya sereke ye. Lê di van salên dawî de rewşa hewayê li seranserê cîhanê hatiye guhertin. Çimkî baran kêm e û ne di dema xwe de dibare. Ji ber wê bandoreke neyînî li çandinî û sewalkariyê hatiye kirin. Îsal jî baran li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kêm bû. Ev jî ziyanê ne li sewalvanan tenê li rewşa sewaldarî û aboriya herêmê jî dike. Lewma, bihayê êmê sewalan pir bilind bû ye û sewalvan êdî nikarîbûn sewalên xwe xwedî bikin. Herwiha di salên derbasbûyî de gelek sewalvan ji bo ku êm ji sewalên xwe re peyda bikin nîvê sewalên xwe bi bihayekî pir kêm difirotin û bi van pereyan êm ji sewalên xwe yên mayîn re dikirîn. Ev yek jî bû sedema kêmbûna ji sedê 40 ji sewalan li herêmê di van du salên borî de. Ji bo wê jî îsal Rêveberiya Sewaldariyê bi tevayiya derfetên heyî êm li sewalvanan belav kir û pêwîstiyên wan peyda kirin.





### Sedemên kêmbûna sewalan li herêmê

Hejmara sewalan li herêma Cezîrê gelekî kêm bûye. Lewma hejmara pez ji sedê 30, dewar ji sedê 40 û mirîşk jî ji sedê 50 kêm bûye. Sedemên sereke yên kêmbûnajmara sewalan nebûna baran, ziwabûna dijwar e û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker e.

Di derbarê rewşa sewalan bi giştî di sala 2022an de û cûdayiya wê ji salên borî, sala 2022`an baş bû. Ev yek jî encamên rêkxistinkirin, dabeşkirina sewalan û derçûna berhemê çandiniya avî yê îsal bû. Ji bo wê jî ev yek ji sewalvanan re bû alîkar û hişt ku rewşa sewldariyê li herêmê bi pêş bikeve.

### Serjimariya sewaldariyê ya 2022`an

Herêma Cezîrê bi xwedîkirina sewalên wek, pez, bizin, dewar, deve, hesp, gamêş û mirîşkan nvdar e. Herwiha li gorî serjimariya Rêveberiya Sewaldariyê li herêma Cizîrê di sala 2022`an de 4 milyon û 465 hezar û 486 serî pez, 420 hezar û 680 serî bizin, 57 hezar û 259 serî çêlek, 7 hezar û 379 serî deve, 6 hezar û 849 serî hesp, 3 hezar û 756 serî gamêş li herêmê hene. Herwiha jimara kesên ku van sewalan xwedî dikin jî 79 hezar û 333 ye.

Belavkirina êm li ser sewalan yek ji gavên girîng e ku ji hêla rveberiya Sewaldariyê, tê kirin. Herwiha belavkirin li gorî navên qeydkirî ji hêla Komîteyê ve tê kirin, ev belavkin barê madî li ser milê xwediyên sewalan sivik dike. Lewra şêniyên Herêma Cizîrê bi taybetî yên gundan piraniya wan sewalan xwedî dikin. Herwiha çavkaniya wan ya sereke xwedîkirina sewalan e. Ji bo wê jî ew bi tevayiya derfetên heyî hewl didin ji wan re bibin alîkar.

Salên ku baran zêde dibariya şînatî çêdibû û welatiyan sewalên xwe diçêrandin. Ji ber wê berhemên sewalan yên weke penîr, mast, şîr û her wekî din hebûn. Lê îsal baran zêde nebariya û rewşa kesên ku sewalan xwedî dikin pir zehmet bûye. Ji bo wê rêveberiya Sewaldariyê xwest ku alîkariya sewalvanan bikin. Herwiha êm li herdû kantonên Qamişlo û Hesekê belav kir. Destpêkê rêveberiyê li her bajarî jimara sewalan diyar dikir, da ku li gorî hejmara sewlan êm were belavkirin.



### Dewreyên belavkirina êm li sewalvanan

Herwiha Ji bo çareserkirina pirsgirêka sewalvanan û peydekirina êm ji sewalan re, Rêveberiya Sewaldariyê ya herêma Cizîrê êm li Sewalvanan belav kir. Ji bo wê jî rêveberiyê di sala 2022`an de li kantona Qamişlo, navçeyên Dirbêsiyê, Zerkan û Holê dewreya yekê ya belavkirina êm li sewalvanan bi dawî kir, li kantona Hesekê jî belavkirin li hin gundewarên hatiye bidawîkirin. Niha jî Rêveberiya Sewaldariyê amadekariya belavkirina dewreya duyem li ser kantona Qamişlo dike. Herwiha ji bilî belavkirina êm li van bajaran rêvberiyê sê caran êm li gamêş û du caran jî hespa belav kiriye, lewra hejmara gamêş û hespan li herêmê kême.

Dewreya belavkirina êm pêwîste her du mehan carekê were kirin. Lê ji ber kêmbûna pêwîstiya êm di depoyên êm de, rêvveberiya necar bû her şeş yan heft mehan carekê êm bli sewalvanan belav bike, lê dîsa jî rêveberiya bi derfetên heyî barekî mezin li ser sewalvanan rakir.

### Qaseya belavkirina êm ji bo her sewalî

Rêvberiya Sewaldariyê ji bo her serî pez 10 kîlo û çêlek, hesp, deve û gamêş her serî 50 kîlo êmê nexalê li sewalan belav kir. Bihayê her kîloyî li deverên din zêdeyî 800 lîreyên Sûrî ye, lê rêveberiyê bi 450 lîreyî dida sewalvanan. Herwiha ji bilî nexalê jî îsal rêveberiyê madeya toza pembo jî belav kir. Êmê ku tê dayîn jî berhemê aşê li herêmê ye. Li gorî rêveberiyê, di sala 2021-2022`an de 23 hezar û 566 ton êm hat belavkirin, di destpêkê de bi 450 lîreyên sûrî dihat belavkirin, niha her kîlo bi 750 lîreyên sûrî dide sewalvanan. Li herêma Cizîrê jî şeş navendên êm li ser asta herêmê hene. Navendek li Qamişlo, yek Tirbespî, Dêrik, Tilkoçer, Dirbêsiyê û du navend jî li Hesekê hene. Her navendek jî dikare 20 ton êm di nava xwe re vehewîne. Herwiha ji bilî wê jî 446 gedîgehên mirîşkan hene. Rêveberiyê di nav kar û xebata 2022`an de, 421 hezar û 900 paketên derziyên xuriya mirîşkan, 212 hezar pakêt derziya (Antro) û 209 hezar lître dermanê zeytî hatin dayîn. Evderman jî bêpere ji sewalvanan re tên dayîn. Herwiha milyonek û 485 hezar û 935 lître mazotê li gedîgehên mirîşkan belav kir.

Herêmên ku bi awayekî zêde sewal lê tên xwedîkirin wek, kantona Qamişlo, navçeya Tilhemîs, Tilkoçer, kantonên Hesekê, Şedadî, Merkade û Holê ye. Lewra zeviyên çandiniyê li van bajaran zêde ye.

### Zehmetiyên û astengiyên sewaldariyê li herêma Cizîrê

Yek ji zehmetiyên herî girîng yên ku rêveberiya sewalvaniyê li herêmê dikşîne kêmbûna baranê û berhemê çandiniyê ye. Ji bo wê jî aliyê rêveberiyê zehmetî di peydakirina êmê sewalan û rêxistinkirina dewreyên belavkirinê de dibîne. Çareseriya bingehîn ya vê pirsgirêkê başkirina berhemê demsala çandiniyê de ye. Ji ber ku xwarina sereke ya sewalan ceh û şînahî ye.

### Plan û projeyên sewaldariyê yên paşrojê

Derbarê plan û projeyên Rêveberiya Sewaldariyê li herêma Cezîrê, di heyama bê de, dê gedîgeheke hêkên mirîşkan li herêmê were vekirin. Da ku hêk li bazarên herêmê bi buhayên guncaw were firotin. Herwiha xebata rêveberiyê yên ji bo belavkirina êm û dermanan berdewam dikin. ji bilî wê jî di sala bê de wê rêveberiyê hewl bide dewreyên belavkirina êm zêdetir bike û rewşa sewaldariyê li herêmê baştir bike.



# Operasyona Birûska Cizîrê dewam dike

Di roja 3'yemîn a operasyona 'Birûska Cizîrê' de li gundewarên Til Hemîsê 32 çeteyên din ên DAÎŞ'ê hatin girtin. Li navçeya Til Birakê jî operasyonê destpê kir.



**Navenda Nûçeyan**

Têkildarî encam û rêveçûna Operasyona Birûska Cizîrê di roja 3`yemîn de, Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) daxyaniyek weşand.

QSD'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku hêzên wan bi hevkariya Hêzên Ewlekariya Hundirîn û Koalîsyona Navneteweyî operasyonên pêşwext ên şopandina şaneyên DAIŞ'ê û tunekirina cihên wan ên veşartinê li herêma Til Hemîsê û Holê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dewam dike û wiha dewam kir: "Di vê çarçoveyê de, hêzên me li gundewarên li rojavayê Til Hemîsê 32 çete girtin, 3 çeteyan ji wan di demên dawîn de bi erkên şopandinê yên DAIŞ'ê radibûn û di lîsteya çeteyên ji bo edaletê tên xwestin de ne."

QSD'ê ragehand ku di roja 3'yemîn a operasyonê de, piştî agahiyên têkildarî tevgerên bi guman ên şaneyên terorîst û hewldana wan a revê hatin bidestxistin, şopandina ewlehiyê berfireh bû û bajaroka Til Birakê girt nav xwe. QSD'ê diyar kir ku hêzên wan 3 çeteyên terorîst ku ji cihên xwe yên veşartinê reviyane malên sivîlan ên li rojhilatê bajarok şopandin, gundiyan çete ji gund qewitandin, piştre ew çete hatin girtin.

QSD' da xuyakirin ku di operasyonên ewlehiyê yên roja 3'yemîn de, hêzên hevbeş cilên leşkerî û cilên ku endamên şaneyên terorîst ji bo xweveşartinê bi kar dianîn, desteser kirin.

QSD'ê got, her wiha 6 çeteyên ku di cihên hewandina endamên terorîst û peydakirina madeyên lojîstîkê ji wan re kar dikirin, hatin girtin. Hêzên me operasyonên taybet li bajaroka Til Birak û gundewarê wê û gundewarê Til Hemîsê dewam dike.

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) da zanîn ku di lêpirsînên destpêkê yên bi endamên terorîst re, hat tespîtkirin ku wan kesan hewl daya herêmên Til Hemîs û Til Birakê ji bo parastina xetên xwe yên piştevaniya derve ji herêmên derveyî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, biparêzin.

# Gelek kesan ji bo şehîdên Parîsê nimêj kirin

***Li mizgeftên girêdayî Civaka Îslamiya Kurdistanê (CÎK) bi hezaran kes ji bo şehîdên Parîsê nimêj kirin.***

Li Ewropayê nêzî 50 mizgeftên girêdayî Civaka Îslamiya Kurdistanê (CIK) hene. Ji bo şehîdên Parîsê li hemû mizgeftên girêdayî CÎK'ê nimêja cinaze hate kirin. Bi hezaran kes ji bo şehîdan hatin cem hev. Mele Eşref li Mizgefta Saîdê Kurdî ya li Bremenê nimêj da destpêkirin. Mele Eşref ji ajansa me re axivî û got, "Em li hemû mizgeftên xwe ji bo şehîdên Parîsê hatin cem hev. Me sohbet, xutbe û weaz dan. 300 kesî li mizgefta me ya li Bremenê taybet ji aliyê dewleta Tirk ve hatine hilbijartin. Hevrêya me Evîn Goyî tevgera jinê temsîl dikir, hevrêyê me Mîr Perwer temsîla hunerê dikir û hevrêyê me Abdûrrahman Kizil jî welatparêzî temsîl dikir."

### 'Ji ber beşdarbûeke mezin cih nema '

Mele Eşref da zanîn ku ew her hefte ji bo nimêja înê tên cem hev, lê dema ragihandin ku dê ji bo şehîdan nimêja cinazê bê kirin, hejmara kesên hatin du qat zêde bûye. Mele Eşref got, "Ji ber ku cih tunebû hin kesên me li derve nimêj kirin. Xwedê ji hemû gelê me razî be. Peyva Şehîd namirin,



nimêj kirin."

Ji bo şehîdan li dehan bajarên wekî Berlîn, Hagen, Wûppertal, Essen, Denhag, Parîs, Metz û Marsîlyayê li nêzî 50 mizgeftan nimêja cenaze hate kirin.

Mele Eşref di axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Her sê hevrêyên me yên şehîd kedek mezin dane. Bi taybetî hatine hilbijartin. 'Kujer negot ez derkevim qatê jor, hima kî derkeve pêşberî min ez gulebaran bikim.' Ev hevrêyên me bi peyveke Xwedê ye. Şehîd ji aliyê fîzîkî ve dimirin, lê bi milyonan xwedî li alaya wan derdikeve. Îro li seranserê Kurdistan û Ewropayê bi milyonan kes xwedî li şehîdên xwe derketine. Ruhê yekîtî û hevgirtinê li hemû mirovên me yên ji bo nimêjê hatin, ji ber ku wezîfeyên xwe yên manewî bi cih anîn, zêde bûn. Em spasiyên xwe li hemû gelê xwe yê beşdarî nimêjê bûne, dikin." ***ANF***

# Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê dewam dike

**Navenda Nûçeyan**

**Tevî ku rêjîma Îranê li hemberî xwepêşanderan girtin, êşkence û kuştinê jî dike, gelên Rojhilatê Kurdistan û Îranê serhildana li dijî rêjîmî bênavber didomîne, herî dawî li bajarê Ciwanro yê Rojhilatê Kurdistanê ciwanekî Kurd di êrişa hêzên rêjîma Îranê de jiyana xwe ji dest da.**

Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê bê navber dewam dike. 30'ê Çileya 2022'an de li bajarê Zahîdan piştî nimêja Înê bi sedan kes daketin kolanan û xwepêşandan lidarxistin. Xwepêşanderan tevî dirûşmeyên dijî desthilatê, nerazîbûna xwe hemberî cezayê darvekirinan jî nîşandan û piştgirî dan girtiyên siyasî.

Li Rojhilatê Kurdistan bajarê Pîranşarê merasîma çileya Karwan Qadir Şukrî hate lidarxistin. Di merasîmê de axaftin hatin kirin û hate gotin ku şehîdên serhildanan nîşan didin ku ew hêjayî jiyanek baştirin, jiyanek wekhevin. Herî dawî girseya gel bê navber dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' qêriyan. Li bjarê Xuremawa ya Loristanê jî merasîma çileya Hisên Zerîncuyî bi pêşengiya jinan hate lidarxistin.

Herwiha li bajarê Êze ya Xuzistanê merasîma çileya Mîlad Seîdyan bi tevlîbûna sedan kes pêkhat. Li heman bajar cenazeyê Mehmud Ehmedî ku di êrişa hêzên Îranê de hatibû qetilkirin, spartin axê. Doh li bajarê Ciwanro merasîma çileya 7 xwepêşanderên ji aliyê hêzên Îranê ve hatibûn kuştin, hat lidarxistin. Ji bo Îran rê li merasîmê bigre, hêz şand Kirmaşanê. Dema ku xwepêşanderan dest bi



mersîmên çileya 7 xwepêşenderan kirin, rêjîma Îranê êrîşî wan kir. Li gorî agahiyan, di êrişa hêzên çewisandinê yên Îranê de welatiyê Kurd ê bi navê Burhan Îlyasî jiyana xwe ji dest da. Li gorî dîmenên ku li ser toerên civakî hatibûn parvekirin, li bajarê Ciwanro hêzên Îranê bi guleyan êrişî û gaza şit êrîşî xwepêşanderan kirin.

Li gorî rapora dawî ya Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê heta niha di xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de 476 kes hatine qetilkirin ku piraniya wan Kurd û Belûçî ne.

# HPG: Artêşa dagirker bi bombeyên qedexekirî êrîşî qadên gerîla kir

**Navenda Nûçeyan**

**HPG`ê ragihand ku rtêşa Tirk a dagirker li nêzî gundê Sîda yê nehiya Şêladizê ya Başûrê Kurdistanê 2 caran bi bombeyên qedexekirî êrîş birin ser çeperên berxwedanê yên gerîla.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê ragehand ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên bi çekên qedexekirî yên li ser qadên gêrîla bênavber dewam dikin.

HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker li nêzî gundê Sîda yê nehiya Şêladizê ya Amediyê 2 caran bi bombeyên qedexekirî êrîş bir ser çeperên




berxwedanê yên gerîla. Herwiha bi obus, hawan, tank û çekên giran bi dehan carî bombe li qadê barand. Di heman demê de 5 caran bi balafirên şer bombe li qadên gerîla barand.

HPG'ê derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî wiha gopt: " Di 30'ê Kanûnê saet di 13:40 û 14:30'î de li nêzî gundê Sîda yê nehiya Şêladizê ya Amediyê 2 caran bi bombeyên qedexekirî çeperên berxwedanê yên gerîla hatin bombekirin."

HPG' da zanîn ku di 30'ê Kanûnê de Gundê Sarkê yê Garê, Qada Golka ya Metîna û Girê 23 ê Qendîlê 5 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.

HPG'ê diyar kir ku di 30'ê Kanûnê de li qada Geliyê Lolanê yê Xakurkê, qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya Amediyê û nêzî gundê Sîdayê çeperên berxwedanê yên gerîla bi dehan carî bi obus, hawan, tank û çekên giran hatin bombekirin.

# Li herêmên serweriya hikumeta Şamê aloziya aborî dijwar dibe, çareserî tune ye

Li herêmên hikumeta Şamê, qada aborî di rewşeke herî aloz re derbas dibe. Bilindbûna nirxê sotemeniyê bandor li hemû qadên jiyanê kir. Lêkolînerekî aboriya siyasî diyar kir ku li gel zihniyeta aborî ya heyî ev alozî derbas nabe û got: "Çareseriya rasteqîn girêdayî bidawîkirina sedemên aloziya Sûriyê ye."

Aloziyên aborî û debarê yên li herêmên hikumeta Şamê her ku diçe dijwartir dibe. Nirxê dolarekî amerîkî gihaşt nêzî 7 hezar lîreyên Sûriyê. Di encamê de nirxê madeyên sotemenî, xwarin û dermanan bilind bû.

Wezareta Bazirganiya Hundirîn a hikumeta Şamê beriya derdora du hefteyanê nirxê lîtreyeke benzîna oktan 90 kir 3 hezar lîre, benzîna oktan



90 a azad kir 4 hezar û 900 lîreyan, nirxê lîtreyeke benzîna oktan 95 kir 5 hezar û 300 lîreyan. Li hember vê yekê şêniyan bertek nîşan da.

### NIRXÊN MADEYÊN XWARINÊ JI SEDÎ 90 BILIND BÛN

Bi daketina nirxê lîreya Sûriyê li hember dolar û kêmbûna derfetên kar re, nexasim ku mûçeyên mehane heta niha 150 hezar lîre ne, rewşa welatiyan dijwartir dibe û gelek karmend neçar dimînin ku dev ji karê xwe berdin û li karên din bigerin.

Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) da zanîn ku li Şamê nirxên madeyên xwarinê bi rêjeya ji sedî 30 bilind bûn. Nirxê kîloyeke şekir a bi rêya "kartê" gihîşt 4 hezar û 600 lîreyan, kîloyê mast 4 hezar lîreyan, kîloyeke şîr bi 3 hezar û 500 lîreyan, kîloyê lebnê bi 14 hezar lîreyan û yê penîr 19 hezar lîreyên Sûriyê ne.

### QADA TENDURISTIYÊ JÎ BÊPAR NEMAN

Qada tenduristiyê jî ji bandorên krîzê bê par nebû. Di encama vê yekê de nirxên nêzî 20 cûreyên derman nexasim ên nexweşên giran wek ên dil zêde bûn.

Endamê Meclisa Yekitiya Dermansazan a hikumeta Şamê Mihemed Nebîl El Qesîr destnîşan kir ku sedema zêdebûna nirxên dermanan ji ber kêmbûna sotemeniyê ye. El Qesîr da zanîn ku rêjeya zêdebûna nirxên dermanan ji sedî di navbera 22 heta 26`an de ye.

### TEVGERA ÇÛN Û HATINÊ JÎ BIBANDOR BÛ

Ji ber bilindbûna nirxê sotemeniyê ku lîtireyeke benzînê li sûka reş gihîşt zêdetirî 13 hezar lîreyan û yê mazotê 9 hezar lîreyan, tevgera çûn û hatinê jî bibandor bû. Di encamê de tevgera erebeyan li bajarên herî mezin jî kêm bû, ji ber vê yekê karmend û xwendekarên zanîngeh û dibistanên li ser rêyên zanîngeh û dibistanên xwe gelek zehmetiyan dikişînin.

### HÊRSA GEL

Beriya çend rojan li Şam û Siwêdayê gotinên dij hikumeta Şamê li ser dîwaran hatibûn xêzkirin.

Li Siwêdayê şêniyan li dijî rewşa aborî ya xirab xwepêşandan li dar xist, girtin ser avahiyên hikumetê, daxwaza pêkanîna biryara navneteweyî ya 2254`an kir.

Têkildarî vê krîzê lêkolerê aboriya siyasî Yehya Omer ji ajansa me re axivî û da zanîn ku li herêmên hikumeta Şamê xerbatirîn krîza aborî diqewime ku di encamê de û ji ber nebûna sotemeniyê hikumeta Şamê neçar ma ku betlaniyeke ji bo 10 rojan ragihîne.

Omer wiha domand: "Di encama vê krîzê de gelek xetên berhemdayînê rawestiyan, ji ber wê jî made li sûkê kêm bûn û nirxê lîreya Sûriyê li hember dolar jî pir kêm bû ku her dola-



rek bi 7 hezar lîreyan e. Di vê rewşê de mûçeyê mehane yê karmendek hikumetê di rewşên herî baş de 25 dolaran derbas nake."

### ÇARESERÎ BI BIDAWÎBÛNA KIRÎZÊ VE GIRÊDAYÎ YE

Pispor û analîzerên aborî hişyarî dan ku eger hikumeta Şamê bi heman zihniyetê tev bigere dibe ku karesatên mirovî rû bidin û rêjeya xizaniyê zêdetir bibe.

Omer got, "Li gel hilweşîna nirxê lîreya Sûriyê, krîza aborî û kêmbûna madeyên xwarinê, nirxê madeyan di sûkên xwecehî de ji sedî 30 derbas kiriye. Dibe ku hîna bilindtir bibe, di encamê de wê xizantî û xetereyên ewlehiya xurekê zêdetir bibin."

Di dawiya axaftina xwe de Omer wiha axivî: "Eger hikumeta Şamê bi vê hişmendiyê berdewam bike, krîz wê çareser nebe. Hikumeta Şamê êdî bûye hikumeta bacan. Ev jî dibe ku bibe sedema hêrseke mezin a gel. Çareseriya rastî ew e ku sedemên krîzê bên bidawîkirin, ji bo vê jî çareseriya siyasî ji bo krîza Sûriyê gerek e. Lê ev jî di demeke nêzîk de nepêşbînkirî ye."*-ANHA*

## Li Parîs lêgerîna edaletê



Farûk SAKIK

Dewleta Tirk a dagirker, di van salên dawî de, di siyaseta xwe ya dijminatiya Kurdan de derbasî merhaleyek nû bû. Dema ku di êrişên xwe yên dagirkerî an jî tunekirinê de encam negirt serî li cûreyek dijminatiyê ya din da; Êşandina Kurdan.

Dema cîhan amedekariya saleke nû dikir û Kurdan jî amadekariya bîranîna komkujiya Parîsê ya 2013'an dikir, li Parîsê xebera komkujiyeke din hat. Bi komkujiya ku 3 kurd hatin şehîdxistin, dilê kurdan carek din êşiya.

Dijminê kurdan serî li hin komkujiyên wisa dide dixwaze bi tenê kurdan biêşîne. Li Parîsê Kurd êşiyan. Meş li Parîs hatin lidarxistin û Kurdan doza edaletê kirin. Dema ku meşê de hin bûyer qewimîn, hin kes bê wijdan û bêexlak, 3 şehîdên me ji bîr kirin û behsa texrîpkirina 10 cm asfalt kirin. Di wê meşê de kurdan çi dixwest pirs nekirin.

Em bi bîr bixin doz û xwestekên Kurdan çi ne: Komkujiya Parîsê ya yekem bi her awayê derket holê ku dewleta Tirk ev komkujî pêk aniye. Divê dewleta Tirk were mehkûmkirin.

Divê, PKK ji lîsteya reş were derxistin. Êrîş û zextên li ser siyasetmedar û saziyên kurdan werin rawestandin.

Divê, statuya Rojava ya xweseriya demokratîk ku bi bedelên mezin bidestketî were nasandin û parastin.

Bi gelek belge û delîlan hat îspatkirin ku dewleta Tirk li hemberî kurdan çekên kîmyevî bi kar tîne. Divê ku dewletên Ewropa midaxle bikin da ku çekên kîmyewî li Kurdistanê neyên bikaranîn. Û dîsa divê dewleta Tirk ji ber sûcên xwe yên şer li 'dadgeha sûcên şer' were darizandin.

Di kompolya navnetewî de rol û rûreşiya dewletên Ewrûpa heye. Ji bo paqijkirinvê rûreşiya xwe divê demildest tecrîda li Îmrali were rakirin û Reber Apo azad bibe.

Kurdan mirovahî ji DAIŞ'ê rizgar kir. Kurdan dawî li teqînên li Parîs û deverên din anî. Hûn ji wan Kurdan re deyndar in. Îroj dewleta Tirk bi balafirên şer êrişî wan Kurdên ku we parastine dike. Divê ku qada hewayî ji êrişên dewleta Tirk re were qedexekirin. Hûn bixwazin dikarin pêşî li vê yekê bigirin.

Û ya herî girîng Komkujiya 23'yê kanûna 2022'yan di warê edaletê de, aqûbeta komkujiyên din e jî, ji bo delîl û belgeyên komkujiyê neyên wendakirin divê tedbîran bigirin.

Heger hûn van yekan pêkneynîn, bizanibin ku ev car Kurd wê êşa xwe veguherînin tolhildanê.

Piştî komkujiya dawî, gerîla li rextê xwe jarjorek zêde kir. Ji dagirkeran tolê bigire.

Kurdên li Ewrûpa jî, li her qadên jiyanê dozaja têkoşîna xwe zêde kirin. Ji bo ku vê bêdengî û xemsariya Ewropa berteraf bikin, êdî weke berê li benda edalet û hiqûqa Ewrûpa nemînin, xwebiparêzin û di têkoşîna xwe de israr bikin.

Dewletên Ewropa bi Peymana Lozanê axa me parve kirin. Piştî peymanê hatin li welatê me bi cîh bûn û bi salan dewlemendiyê me girtin birin Ewropa. Dema ku çûn jî, me di nav lepê 4 dagirkeran de hiştin. Dagirkera zilm kir û Kurd jî koçî welatê we kirin.

Ji bo vê yekê mafê kurdan heye wan mijarên min li jor rêzkirin ji dewletên Ewropa bixwazin.

Hûn çima kurdên xwe spartine welatê we naparêzin? Piştî ku hatin qetilkirin jî, hûn çima edaletê pêk naynin? Ji bo vê yekê kurd bihêrs in û bi israr doza edaletê dikin.

Evcar em ê destûr nedin ku hûn Kurdan bikin qurbana, berjewendiyên xwe yên siyasî, aborî û dîrokî yên bi dewleta Tirk re. Kurd piştî her komkujiyê diha zêde bi hirs dibin û vê hêrsa xwe jî vediguhêrînin têkoşînê.

# 'Armanca dewleta Tirk ya dagirker qirkirina Kurdan e'

Zana Roj/ Şehba

**Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Efrînê diyar kirin ku armnca dewleta Tirk ya dagirker ji êrîşên kîmyayî yên li ser qadên gerîla qirkirina gelê Kude û gotin, gerîlayên azadiyê parazvanên xeta azadiya gelan e, ew ê bi vîna xwe dagirkeran têk bibin.**

Wekî tê zanîn, dewleta Tirk a dagirker di 14'ê Nîsana 2022'an de li hemberî gerîlayên azadiyê li Zap, Metîna û Avaşînê dest bi êrişeke nû ya qirkirinê kir. Li hemberî van êrişên qirkirinê jî, gerîlayên azadiyê bi vîn û baweriyeke mezin li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk berxwedaneke dîrokî dimeşînin. Artêşa Tirk, ruxmê ku teknîka herî bilind a cîhanê li hemberî gerîla bikar tîne jî nikare îradeya gerîlayan bişkîne. Berevajî armancên xwe, artêşa Tirk li ber berxwedana gerîla li ber têkçûnê ye. Dewleta Tirk a dagirker ji bo rê li ber vê têkçûnê bigire, li gel teknîka bilind her cûre çekên qedexekirî û çekên kîmyawî bikartîne. Dewleta Tirk ya dagirker di şexsê gerîlayên azadiyê de, gelê Kurd û tevayiya gelên azadîxwaz dike armanc.

Derbarê êrîşên kîmyawî yên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser qadên gerîla endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ya Efrînê ji rojnameya me re axivîn û diyar kirin ku wê Gerîlayên Azadiya Kurdistanê bi vîna xwe êrîşên dagirkeriyê têk bibe û dagirkeran ji holê rake.

### 'Hêzên navneteweyî bi bêdengiya xwe hevkarên sûcên dijmirovî ne'

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Efrînê Reşîd Mihemed diyar kir ku bêdengiya navneteweyî nîşaneya hevkariyê bi êrîşên dagirkeriya Tirk re ye û wiha got: "Ev ne cara yekemîne ku dagirkeriya Tirkiyê bi vî awayî êrîşî gerîla dike, dagirkeriyê bi dehên caran qadên gerîla dayê ber çekên kîmyawî. Dewleta dagirker ji destpêka avabûna Tevgera Azadiyê ve û heta roja îro, êrîşên hovanê li ser qadên gerîla pêk



tîne. Dewleta Tirk ya dagirker tevahiya sûcên dijmirovî li ber çavên cîhanê pêk tîne û her kes xwe bêdeng dike. Tevhıya hêzên navneteweyî ji bo girkirina gelê Kurd destekê didin dagirkeriya Tirk û hevkarên sûcên dijmirovî ne."

### 'Armanc qirkirina gelê Kurd e'

Mihemed da xuyakirin ku armanca dewlewta Tirk ya dagirker ji êrîşan qirkirina gelê Kurd e û wiha domand: "Dagirkeriya Tirkiyê li her derê êrîşî gelê Kurd dike. Rojane êrîşê bakur û rojhilatê Sûriyê û qadên gerîla dike. Dagirkeî rasterast welatiyan û binesaziya herêmaên bakur û rojhilatê Sûriyê dike hedef. Herwiha li Ewropayê jî bi riya MÎT'ê li dijî gelê Kurd komkûjiyan pêk tîne. Hebûna Kurdan li ku derê



hebe , dewleta faşîst êrîşî wê derê dike. Armanca wê girkirina gelê Kurd e."

### 'Di şexsê gerîla de gelê Kurd dikin armanc'

Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Xedîca Îbo jî bal kişan ser berxwedanî û têkoşîna gerîlayên azadiyê û wiha got: "Gerîla mîrasê îdeolojiya Rêber Abdullah Ocalan e û parestvanên xeta şaristaniya jiyana azad e, bi salane xwe ji bo azadiya gelê Kurd û gelên azadîxwaz fedayî kiriye. Gelê Kurd wê her dem li pişta gerîlayên azadiyê be û ji bo têkbirina dagirkeriyê wê berxwedanê bidomînê. Emê xeta azadiyê ku şehîdan bi xwîna xwe av dane biparêzin. Emê li ser fikr û felsefeya Rêber Apo asta têkoşîna xwe mezintir bikin."



# KCK: Di sala nû de "Têkoşînê mezintir bikin û jiyanê ava bikin"

**Hevserokatiya KCK peyamek ji bo sala nû weşand.**

**Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK di peyamê xwe de; Ji bo sala 2023'an bibe saleke serketinê bang li hêzên demokrasiyê yên li tevahiya cîhanê kir ku, bi perspektîfa modernîteya demokratîk têkoşînê mezintir bikin û jiyanê ava bikin.**

Navenda Nûçeyan

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya salvegera mîladî daxuyaniyek weşand. Daxuyanî wiha ye:

"Salvegera mîladî ku ji bo civaka Xiristiyan tê wateya Noelê, di vê serdemê de weke cejneke sersalê tê pîrozkirin. BÎ navê tevgerê em jî Noel a civaka Xiristiyan, sersala mîladî ya gelê me û mirovahiyê pîroz dikin û hêvî dikin ku sala nû ji bo gelan, bindestan, jinan û mirovahiyê azadiyê bi xwe re bîne.

### 2022`an de Şerê Cîhanê yê sêyemîn pir giran bû

Em sala 2022'an li pey xwe dihêlin ku têkoşîneke gelekî mezin lê hate dayin û dest bi saleke nû dikin. Sala 2022'an bû saleke welê ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn lê giran bû. Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi şerê Ûkraynayê re yekemcar li derveyî Rojhilata Navîn qewimî be û qada şer bi vî rengî berfireh bû be jî ji destpêkê ve xwedî karaktereke welê ye ku êrişî civakê û xwezayê dike, li her devera civakê diqewime. Di demekê de ku modernîteya kapîtalîst civakê û xwezayê talan û wêran dike, newekheviya navbera mirovan zêde dike; Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ê ji ber krîza sîstema modernîteya kapîtalîst destpê kir, vê pêvajoyê mezintir dike.

Di sala 2022'an de hilweşînerî û şerê sîstema modernîteya kapîtalîst ên li hemberî civak û xwezayê zêde bûn. Li hemberî vê yekê jî têkoşîneke mezin hate dayin û sala 2022'an bû saleke bi têkoşînê dagirtî. Gelan, jinan, ekolojîstan, sosyalîstan, ciwanan, karker, kedkar û xizanan, bi giştî têkoşerên demokrasî, edalet û azadiyê di sala 2022'an de li her qada jiyanê û li her qadê li dijî mêtingeriya modernîteya kapîtalîst, li dijî hilweşîneriya modernîteya kapîtalîst têkoşîn mezin kirin û bênavber meşandin. Ev têkoşîna li dijî modernîteya kapîtalîst ku ji aliyê her beşên civakê ve hate meşandin, bi mejî û hesreta modernîteya demokratîk hate kirin.

### 2022'an de tişta herî zêde derkete pêş, lêgerîn û têkoşîna azadiyê ya jinê bû

Taybetmendiya ku di sala 2022'an de herî zêde derkete pêş, bêguman lêgerîn û têkoşîna azadiyê ya jinê bû. Li dijî sîstem û mejiyê serweriya mêr ku ji dîrokê heta vê serdemê sedema esasî ya hilweşîn û mêtingeriyê ye û di vê demê de jî weke modernîteya kapîtalîst xwe dewam dike, têkoşîna herî radîkal û guherîner ji aliyê jinê ve hate dayin.

Di nava sala 2022'an de, yek ji wan gelan ku herî zêde êrişên mêtingerî, dagirkerî û qirkeriyê li ser hatin kirin û li dijî van êrişan herî zêde li ber xwe dan, têkoşiyan, berdêl dan gelê Kurd e. Desthilatdariya AKP-MHP a faşîst û dewleta Tirk



a qirker mêtinger ku bi mejiyekî dijminatiya li Kurdan tevdigere, li Bakur, Başûr, Rojava, Mexmûr, Şengal, Herêmên Parastinê yên Medyayê û li her devera ku Kurd lê ne êrişên îmha û dagirkeriyê zêde kir.

### Ji aliyê gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê ve berxwedana herî xurt hate meşandin

Bêguman berxwedana herî xurt ji aliyê gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê ve hate meşandin. Gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê di serî de li Herêmên Parastinê yên Medyayê, li her qada ku lê ye li dijî êrişên dagirkeriyê bi ruhê fedaî yê Apoyî li ber xwe dan, êrişên dagirkerî û qirkeriyê pûç kirin. Di nava sala 2022'an de rejîma qirker faşîst ji bo armancên xwe bi ser bixîne, bikaranîna çekên kîmyewî jî di nav de her cûre çekên qedexekirî yên li ber destê xwe bi kar anî û her rêbazên qirêj xiste dewrê. Bi vî rengî hêvî dikir ku li hemberî gerîla encamê bi dest bixe. Lê belê gerîla bi ruhê fedaî yê Apoyî û taktîkên nû yên gerîla ev êriş şikand û nehişt ku dijmin bigihêje armanca xwe.

Em sala 2023'an li gelan, jinan û tevahiya mirovahiyê pîroz dikin, şehîdên ku sala 2022'an bi têkoşînê dagirtin, bi ser xistin û kirin ku em bi hêviyeke hîn mezintir dest bi sala 2023'an bikin, di şexsê şehîdên sala 2022'an de şehîdên şoreşê û demokrasiyê hemûyan bi rêzdarî û minet bi bîr tînin. Şehîd afirînerên nirxên me hemûyan e, pêşengên têkoşîna me ne. Soza serketinê ya ku me dane şehîdan bi vê wesîleyê careke din dubare dikin.

### Di sala 2023'an de wezîfeyên hîn mezintir li pêşiya me hene

Eşkere ye ku di sala 2023'an de wezîfeyên hîn mezintir li pêşiya me hêzên demokrasî û azadiyê ye. Ji bo xwedîderketina li wezîfeyên ku dîrokê daniye ber me û bicihanîna berpirsyariyên xwe em ê hîn bi biryar û têkoşer bin. Li ser vê bingehê, ji bo sala 2023'an bibe saleke serketinê em bang li hêzên demokrasiyê yên li tevahiya cîhanê dikin ku bi perspektîfa modernîteya demokratîk têkoşînê mezintir bikin û jiyanê ava bikin.`

## Civîna Urdunê û Komkujiya Parisê



Ahmet Aktaş

Piştî civîna Emman-Urdunê ya 20.12.2022an, komkujiya 23.12.2022an a Parisa-Fransayê pêk tê.

Ma ne balkêşe, piştî vê civîne 2 rojan, ev êrîşa li dijî rêveber û xebatkarên Tevgêra Azadiya Kurdistanê pêk tê?

Heke pir alî lê were nerîn, têkiliyên berbiçav hene di navbera van bûyeran de.

Hema em bînin bîra xwe, ev êrîşa xedar, di rojên salvegera 10'an a êrîşa qirker ku dîsa li Parisê têkoşerên Kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez kirin hedef, pêk hat. Jixwe armanca bingehîn jina pêşenge !

Her wiha di rojên salvegera 11an a komkujiya Robaskî ya ji aliyê arteşa dewleta Tirk ve pêkhat û 34 welatparêzên Kurd û dîsa di rojên salvegera êrîşa qirker a 44an a Meraşê ya di 19.12.1978an ku bi sedan welatparêzên Kurd hatin şehîd kirin de, pêk hat.

Dewleta Tirk, di kiryarên rojên wisa balkêş de xwedî dîrokek qirêj e.

Ka em vegerin ser êrîşa dawî ya Parisê ku Evîn-Emîne Kara, Mîr Perwer-M.Şirin Aydın û Abdurrahman Kizil lê şehîd ketibûn.

Bêgûman ev êrîş ji aliyê dewleta Tirk ve pêkhatiye. Ji ber ku heman êrîşa berî deh salan jî, yekser ji aliyê MITa dewleta Tirk ve hatibû kirin.

Rayedarên Tirk; Receb û Hulusi, çend rojan berî êrîşî, gotinên tehdîtkar ji Fransa re dikir. Digotin; "Ew marên hûn xwedî dikin, wê bi wê vedin" û hwd. Ji xwe serokê istixbarata leşkeriya wan ê kevn I.H.Pekin, pesindariya qirkeriya Parisê a berê dikir û di got "Divê em çalakiyên wisa li gelek cihên din dewam bikin".

Îca, mijarên ka gelo hilwesta dewleta Fransa wê çibe, dawiya dadigeriyê çi encam jê derbikeve û hwd.(?) giringin!

Encama dadigeriya bûyera berê, neyînî bû! Ji xwe gotina ku, "kujer O.Guney, di zînadê de miri ye", siyaseta dewletparêz nîşan dan. Lewma kesî ji vê daxwiyaniyê bawer nekir. Herwiha ji dadigeriya nuha jî, kes ne li hêviya rastî û edaletê ye.

Ji xwe di despêkê de, ji daxwûyanî hinek rayedarên Fransî û paralelî wan rayedarên Tirk jî, diyar dibû ku dixwazin heman encama O.Guney binin serê kujerê niha jî.

Rojên eykê gotin, "Ev mirovakî psikolojiya wî xerabeye û hwd.". Xwestin bikin kiryarek takekesî û dewletan jê bêrî bikin. Û heke nebû, aqûbeta yê berê bînin sêrê wî jî; mir an hwd! Lê ji ber hilwesta gelê Kurd û dostên xwe, ku bi xurtî li şehîdan û doza Kurdan xwedî derketin, wê nikaribin ser li vê komkujiyê bigrin.

Li aliyê din, guman heye ku li ser vê mijarê, nakokî di navbera rayedarên jor ên dewletê de; di navbera Macron û dijberên wî de hebin.

Ji ber ku ew civîna Urdunê, Macron serkêşî dikir, bi pir aliyên xwe dişibe civîna KAHIRE ya 12.4.1921an.

Erê di wê Konferansa Kahire-Misrê de, Inglîz serkêş bûn. Lê ji ber ku ev Konferansa Emman-Urdinê dewama projeya Sykes-Picot bû, para Fransa nehetibû jibîrkirin. Lê belê ji ber ku mijara hevpar a herdu Konferansan, dijberî û parvekirina Osmanî-Tirkiyeyê bû, hilbet pirsgrêka Kurdan jî xalek sereke bû. Lewma, yekser peywendiyê Konferansa Urdunê bi êrîşa Parisê re heye. Lê mixabin di herdu Konferansan de jî noneriya Kurdan tune bû. Lewma, divê bi taybetî rêveberiya Başûr û Rojava gelek hişyartir tevbigerin!

## FENER

## Fransa Hemsûcê Kujeran E



Idrîs HENAN

Di nav rewşeke siyasî, aborî û leşkerî yê tevlihev de, hêzên serdestiyê ku qonaxeke nû ya sedsala desthilatdariyê dîzayîn dikin, ji nû ve hewl didin Kurdan di çala bindestî û mêtingeriyê de bihêlin. Lew re; her derê bazarên kirîn firotinê hebin, mirov dibîne ku Kurd madeyek bingehîn ê bazarê ne. Kirîz û maseya wan li kuderê dibe bila bibe, ferq nake, her Kurd ecîndeya wan a bingehîn e.

Di vê çarçoveya dermirovî de, lîder, pêşeng, hunermend, rewşenbîr û welatparêzên me tên hedef girtin ku civakê weke masiyê bê av bihêlin û piştre bi yek derbê pergende bikin. Li ser van hesabên mêtingeriyê, hemû aliyên hevakarên hegemoniyê, bi rengekî ji rengan, hem fikir in. Ji ber wê ye jî, li kuderê bandor û tesîrek birêxistibûna Kurdan hebe êriş dikin û hewl didin modela ku felsefeya Kurd a nûjen afirandiye ji nav bibin û tenê modela dane tivîkirin hebe.

Hemû êrişên li ser hebûna Kurd, li her çar beşên Kurdistanê û derveyî welat, di vê çarçoveya tunebûnê de pêk tên. Ji ber vê jî, çiqas cureyên çekên qedexekirî û kîmyawî hebin, li ber rûyê cîhanê, li dijî vîna Kurdan pêk tînin. Bêdengiyê paralelî van êrişan derdikeve jî, ne rasthatinek, lê belê itîfaq û rêdanek têkbirina narvîna Kurd e.

Îro li Fransayê sînaryoya Sara, Leyla û Fîdanan dubare dibe û carek din Kurd dibin mexdûrê wan itîfaqên reş ên paş dîwaran hatine hûnandin. Lê îro ji berê zêdetir Kurd hişyar e û dê hesêb bixwaze.

Aliyek din ve, Fransa ji her wextê zêdetir mecbûr e ku isbat bike; ti têkîliya wê bi vê bûyerê re nîne. Her wiha xwedî wê berpirsyariyê ye ku mijarê nexe oxira berjewendiyên xwe yên siyasî. Ji xwe daxwaza Kurdan û tevgerên pêşeng ew e ku rewş ji hev zelal bibe û Fransa bi sernavên nijadperestiyê dozê nenixumîne û xwe sûcdar nehêle. Êdî ew dema ku têkîliya Istixbaratî ya Tirk ji bûyerê were veşartin qediyaye, ne Frasna û ne jî aliyek din dikarin wê yekê veşêrin.

Di destpêka bûyerê de hêzên polîsên Fransayê, bi rêbazên şîdeta li dijî xwepêşandêran dane meşandin, hewl didan delîlên bûyerê ji holê rakin. Lew re jî bi tundî, bi gaz û mertalan êrişî gelê me yê hêrsbûyî dikirin. Piştî demekê bi gotinên Wezîrê Karê Hundirîn re ev yek eşkere dibe ku reftar û şêwazê êrişa polîsan rexne dike.

Helwesta gelê ku xwedî li cenazeyên xwe derdiket, projeya polîsan têk bir û plana dihat sazkirin ji nav bir. Lew re wezîrê Dadê delegesyona Kurdan qebûl û pêşwazî dike û li xwe mikur tên ku Kurd gelekî rêxistinkirî ye û dikare ewlehiya xwe biparêze. Li Kuderê be jî Kurd ne dijminê ti kesekî ye, lê gelek girîng e hikûmeta Fransa gel bide iqnakirin ku ne di nava vî karî de ye. Ew mejbûrî vê yekê.

Xaleke din a girîng a vê tabloyê jî ew e ku; pêwîste ev doz veguhere dozeke navdewletî û tenê di sînorên Fansayê de nemîne ku li gorî hinek berjewendiyan bête vesazkirin. Çawa ku doza Kurd dozeke navneteweyî û her kesî eleqedar dike, çi kêşe, bûyer, nêzîkatî û destwerdana li ser îradeya wî jî were kirin, dozekên navnetweyî ne. Dozeke têkildarî siyaseta hemû aliyan e ku bê çareserkirina wê û sizakirina sûcdaran, îmkan nîne kirîz û kaosên heyî bên çareserkirin. Berovajî; wê mezitir û berfirehtir bibin.